

## Sebah Elxeyr Ya Xanim

Tu jî gelekî bixêr, Zûbyer Salih..!

*Dîlan Zivingî*

**D**engbêjê hêja û delal , Zûbeyir Salêh, Piştî rêz û silavan: Dema em guhdarî stiranên we dikin , ew dengê xweş û zîz bi hestekî hunerî nazik û tenik li guhên me dikeve . Nemaze ew stirana **Sebah Elxeyr ya xanim** , hestê evîne li rex mirovan vedijîne û mirovan ji jiyana xem û qisawetên rojane bi dûr dixîne, ev reng û sitîlên stiranê mirovan ber ve jîn û jiyana bav û kalan dibe, ku lawên gelê kurd yên mîna nemir Meleyê Cezîrî yên ku ,xebata xwe di riya wêje û helbestan re nîşan didin pir kêr û hindikin ,wan ji zû ve bi dengê bilind û gelekî xurt diyadikin û destên xwe dane ser birîne ku tu kes bê evîn nikare rûyê jiyane yê xweşik û pir şêrîn bibîne, jan û dijiwariya demê bipejirîne .  
Ev li hêlekê û li hêla dinê , ev stiran bi çoşekî pir bilind li hevdu hatiye hunandin, çî mizûk , deng , wêje û h. w.d be ,digel tabiloya sitiranê bi wêneya keça xweşik û nazidar **Leyle Bedir-xan** ya pêşî ji keçên kurd ku, sema û reqisa balê ye , wê bi bejin û

Li - 7-ê Avdarê û li bajarê Helebê , bi boneya cejna jinên cîhanê, ji hêla rêxistina jinan ve ya partiya Yekîtiya demiqurat a kurd li Sûriyê [ Yekîti] ahengek hate li darxistin , bi reqis û sema, çepik lîlî û bi dengê herdu keçikên xweşik û nazdar Nêroz û Mîdiye ve ew ahenga dihate xemilandin . Qaserî -33- jin bi navê parityê hatin xelat kirin . Bi vê boneyê , -8- Avdarê li jinên Cîhanê nemaze li jinên kurd pîroz be .

## Nûçe

bedena xwe ve em bi jiyana û dema malbata Bedir-xaniyan ve dibirin, ku heyf û mixabin ew malbata ji hêla bêbextên tirkan ve, bi hovîti bê sûc û guneh penaber û mişexite kirin , wisan jî ew li hin dewlet û deverên biyanî cîwar bûne , vêca jî wan pir cefakêşî dîtine . Lê, ew bi tu carî ji xebata xwe nemane , di warê zimanê kurdî de bi rêkûpêk xebitîne û pir berhem weke sermîyan ji me re hêştine . Lewre jî, îro em tev deyindarên nemirên mîna Celdet Bedir-xan, mîr kemîran û meleyê Cezîrî û h.w.d ne . Vêca jî em hêvîdar in ku win li ser wa riya hunerê, ya di strana **Sebah Elxeyr ya xanim** de xebata xwe bajone serî, bi vê awî û bi ya me be , bêgûman winê bi serbilindî cihekî bêlikirî di nava civakê de bigirin .. Li dawî jiyana û duhatiyeye xweş û serkefîti ji we re hunermedê hêja hêvî dikin, digel gurzek gulên renga-reng yên Buhara çiyayê kurimênc diyarî we û xwendevanên rojnama NWEROZ dikim û dibêjim roj baş hunermendo.. Welato.. Bavo.. Jîyano..